# Bultena heftane

# 11/11/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

Nûçeyên ji cîhanê

# Dewleta Fransayê çalakvana Filistînî şand Misrê

Hat hînbûn ku endama Eniya Gel a Rizgariya Filistînê Meryem Ebû Daqqa a ku der barê wê de biryara 'dersînorkirin' hatibû dayîn ji aliyê Şûraya Dewleta Fransayê ve şandin Misirê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dewleta-fransaye-calakvana-filistini-sand-misre-41987



## [‘Berxwedana jinan a gerdûnî di têkoşîna bi şîdetê re bû xwedî tecrube’]

Aktivîstên jin ên Misirê diyar dikin ku di têkoşîna bi pêkanînên li dijî mafên jinan de hê riyeke dûr û dirêj heye û gotin ku têkoşîna li dijî şîdetê ya gerdûnî bûye xwedî tecrubeyek girîng.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/berxwedana-jinan-a-gerduni-di-tekosina-bi-sidete-re-bu-xwedi-tecrube-41963



## [‘Heta parastin tunebe jiyana jinan û civakê bi aram nabe’]

Li Şengalê komxebata jinan a parastinê ya ku bi wesîleya salvegera rizgarkirina Şengalê bi dirûşma “Bi Jin Jiyan Azadî me li ber xwe da Şengal rizgar kir bi têkoşîna xwe em diparêzin” bi kelecaneke mezin berdewam dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/heta-parastin-tunebe-jiyana-jinan-u-civake-bi-aram-nabe-41965

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Efgan ên koçberên Îranê di şertên zehmet de dijîn](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-efgan-en-kocberen-Irane-di-serten-zehmet-de-dijin-41966)

Bi destdanîna Talîbanê ya li ser rêveberiya welat koçberên Efganistanê, koçî gelek welatên cîhanê kirin. Koçberên ku çûne Îranê di mercên zehmet de dijîn. Jinên ku ji cihê xwe bûne bi firotina cilan hewl dide li ser lingan bimînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-efgan-en-kocberen-Irane-di-serten-zehmet-de-dijin-41966

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Sûryeyî li dijî qeyrana aborî alternatîfên cuda ava dikin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-suryeyi-li-diji-qeyrana-abori-alternatifen-cuda-ava-dikin-41967)

Jinên li Sûriyeyê dijîn li dijî qeyrana aborî berhemdariya xwe ya karên destan bi pêş dixin û hewl didin di jiyanê de bi keda xwe bimînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-suryeyi-li-diji-qeyrana-abori-alternatifen-cuda-ava-dikin-41967

Çavkanî:JINHA



## [Kesên diçin serdana Nergîs Mohammadî gef li wan dixwin û tên girtin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/kesen-dicin-serdana-nergis-mohammadi-gef-li-wan-dixwin-u-ten-girtin-41969)

Xwediya xelata Nobelê aktivîsta Îranê Nergîs Mohammadî piştî ku rakirin nexweşxaneyê, gelek kesên ku diçin serdana wê gef li wan dixwin û tên girtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/kesen-dicin-serdana-nergis-mohammadi-gef-li-wan-dixwin-u-ten-girtin-41969

Çavkanî:JINHA



## [Jinan xwest çawişê pispor were girtin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinan-xwest-cawise-pispor-were-girtin-41972)

TJA'yê li Nisêbînê berdana çawişê pispor Eyup K. yê ku dest dirêjî çar zarokan kiribû bi meşekê şermezar kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinan-xwest-cawise-pispor-were-girtin-41972

Çavkanî:JINHA



## Li zanîngeha Azad a Tehranê xwendekarek jin rastî êrîşê ha

Li zaningeha Azad ya Îranê xwendekarek jin bi hinceta ku li gor qanuna hicabê tevnegeriyaye ji aliyê hêzên ewlekariya zaningehê ve rastî êrîşê hat. Hat ragihandin ku xwendekara jin rakirine nexweşxaneyê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-zaningeha-tehran-xwendekarek-jin-rasti-erise-hat-41982

Çavkanî:JINHA



## Çalakvana Tûnisî bang li jinan kir: Divê em dîsa vegerin kolanan

Aktivîsta femînîst Aida Ben Shaaban, diyar kir ku zêdebûna tundî û qetlîamên li ser jinan li Tûnisê metirsîdar e, bang li jinan kir ku vegerin kolanan û bertekên mezin nîşan bidin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakvana-tunisi-bang-li-jinan-kir-dive-em-disa-vegerin-kolanan-41984

Çavkanî:JINHA



## Berdevka Meclisa Jinan a HEDEP'ê:Emê destkeftiyên ku ji me hatin dizîn bigrin

Berdevka Meclisa Jinan a HEDEP'ê Halîde Turkoglu di konferansa Desteya Jinan a Rêveberiyên Herêmî yên Demokratîk de axivî û got: "Her ku em biçin hilbijartinê ve biçin, em ê her tiştên ku ji destê me hatine dizîn emê vegerînin."

Çavkanî:JINHA



## Rojnamegerên jin ên Yemenî: Rola me sînordar e

Rojnamegerên jin ên yemenî diyar kirin ku bi taybetî piştî derbeyê rola wan sînordar bûye, dan zanîn ku daxwazên jinan ên di saziyên çapemeniyê de cih digrin jî tên paşguhkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnamegeren-jin-en-yemeni-rola-me-sinordar-e-41986

Çavkanî:JINHA



## Aktîvîstên TJA’yê bi çepikan hatin pêşwazîkirin

Jinên ku ji Doza TJA'yê serbest hatin berdan li Amedê bi dirûşma "Jin jiyan azadî" û tilîliyan hatin pêşwazîkirin. Jinan di pêşwazîkirinê de peyama berdewamkirina têkoşîne dan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/aktivisten-tja-ye-bi-cepikan-hatin-peswazikirin-41989

Çavkanî:JINHA



## ‘Bi mezinkirina parastina xwe em ê xweseriya xwe misoger bikin’

Jinên Şengalê der barê girîngiya komxebata ku li dar xistine de nirxandin kirin û gotin ku ji bo jinan parastin ji av û nan girîngtir e.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bi-mezinkirina-parastina-xwe-em-e-xweseriya-xwe-misoger-bikin-41994

Çavkanî:JINHA



## [Li Efganistanê jin li hemberî qedexeyan bi projeyên nû li ber xwe didin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-efganistane-jin-li-hemberi-qedexeyan-bi-projeyen-nu-li-ber-xwe-didin-42000)

Jinên li Efganistanê li hemberî zextên Talîbanê bi projeyên nû li ber xwe didin. Kursa ku ji aliyê weqfa Berbangê ve hatiye vekirin 80 jin jê mezûn bûn. Sahar Rahmî ya ku di kursê de şagird e got: “Li pişt her tarîtiyê ronahî heye.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-efganistane-jin-li-hemberi-qedexeyan-bi-projeyen-nu-li-ber-xwe-didin-42000

Çavkanî:JINHA



## [Encamnameya dawî ya Konferansa Jinan a Rêveberiyên Herêmî hate eşkerekirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/encamnameya-dawi-ya-konferansa-jinan-a-reveberiyen-heremi-hate-eskerekirin-42001)

Di daxuyaniya dawî ya Konferansa Jinan a Rêveberiyên Herêmî ya HEDEP'ê de hat destnîşankirin ku ew ê di hemû mekanîzmayên biryargirtinê de bi prensîba temsîliyeta wekhev tevbigerin û hat gotin ku tiştên ji jin û civakê hatine dê paşve werin girtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/encamnameya-dawi-ya-konferansa-jinan-a-reveberiyen-heremi-hate-eskerekirin-42001

Çavkanî:JINHÎ



## [Hunermenda Kurd Çawan Xelîl xelata lîstikvana jin a herî baş girt](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/hunermenda-kurd-Cawan-xelil-xelata-listikvana-jin-a-heri-bas-girt-42003)

Çawan Xelîl di 4’emîn festîvala navneteweyî a şanoyê ya li Bexdayê de xelata lîstikvana herî baş girt.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/hunermenda-kurd-Cawan-xelil-xelata-listikvana-jin-a-heri-bas-girt-42003

Çavkanî:JINHA




## [Tîma Futbolê ya Jinan a Amedsporê ji qadê serketî derket](https://jinhaagency.com/ku/werzis/tima-futbole-ya-jinan-a-amedspore-ji-qade-serketi-derket-42010)

Tîma Futbolê ya Jinan a Amedsporê li qada xwe Ataşehir Belediyesporê 2-1 têk bir.

https://jinhaagency.com/ku/werzis/tima-futbole-ya-jinan-a-amedspore-ji-qade-serketi-derket-42010

Çavkanî:JINHA



## [Divê jin ji bo aştiyê têbikoşin](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221171)

ÎZMÎR - Jinan diyar kirin ku encama nelihevkirinên di navbera mêran de şer tên meşandin û diyar kirin ku ji bo aştiya li Rojava û Rojhilata Navîn divê jin bi hev re têbikoşin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221171

Çavkanî:JINNEWE



## ['Hişyariya li dijî tundiya li ser jinê girîng e'](https://jinhaagency.com/ku/rojane/hisyariya-li-diji-tundiya-li-ser-jine-giring-e-42018)

Derûnnas Papula Abdullah bal kişand ser tundiya dijîtal ku di nava cureyên tundiya li ser jinê de ye, destnîşan kir ku bi çalakiyên hişyarkirinê dikarin li dijî tundiya dijîtal têkoşîn bê kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hisyariya-li-diji-tundiya-li-ser-jine-giring-e-42018

Çavkanî:JINHA



## ‘Divê li hemberî sinetkirina jinan hişyariya civakî bê bilindkirin’

Rêvebira Bernameya Mafên Tenduristî û Zêdebûnê ya Weqfa Pirsgirêkên Jinan a Misirê Mejda Silêyman got ku divê bi taybetî rêxistinên sivîl li dijî "sinetkirina jinan" ya li Misrê berdewam dike çalakiyên hişyariyê lidarbixin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/dive-li-hemberi-sinetkirina-jinan-hisyariya-civaki-be-bilindkirin-42020

Çavkanî:JINHA



## ‘Însiyatîfa ji bo koçberên Xezayê û Başûrê Lubnanê hate destpêkirin’

Însayatîfa ku li Lubnanê ji bo kesên li Şerîda Xezayê û başûrê Lubnanê ji ber êrîşên Îsraîlî ji cih û warên xwe bûne, hatiye çêkirin, armanc dike ku herî kêm heta radeyekê êşan kêm bike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Insiyatifa-ji-bo-kocberen-xezaye-u-basure-lubnane-hate-destpekirin-42024

Çavkanî:JINHA



## Girîngiya vîtamîna D û bandora kêmbûna wê li ser tenduristiya jinan

Li Îranê ji ber quralên cil û bergan jin nikarin vîtamîna D a ku ji bo laşe mirovan gelekî girînge bigrin. Kêmbûna vîtamîna D di gelek jinan de dibe sedemên gelek nexweşiyan

https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/giringiya-vitamina-d-u-bandora-kembuna-we-li-ser-tenduristiya-jinan-42030

Çavkanî:JINHA



## Li Rojhilatê Kurdistanê zehferan bi keda jinan tê hilberandin

Di salên dawî de li Kirmaşanê di çandin û çinîna zehferanê de karker û karsazên jin rolek girîng dilîzin. Zehferana ku hilberîneke nû ya herêmê ye û jêneger e, bi destên jinan tê hilberandin lê jin beramberê vê yekê tişta ku heq dikin nagirin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/li-rojhilate-kurdistane-zehferan-bi-keda-jinan-te-hilberandin-42032

Çavkanî:JINHA



## [Li Mexribê li dijî tundiya dîjîtal banga pêşîgirtinê hat kirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-mexribe-li-diji-tundiya-dijital-banga-pesigirtine-hat-kirin-42038)

Jinên aktîvîstên mafên mirovan ên diyar kirin li Mexribê 1,5 mîlyon jin rastî tundiya dijîtal tên, bangkirin ku ji kiryaran re cezayên bibandor bên dayîn û xwestin rêxistinên civaka sivîl jî rola dikeve li ser milê wan bilîzin.

[https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-mexribe-li-diji-tundiya-dijital-banga-pesigirtine-hat-kirin-42038](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-mexribe-li-diji-tundiya-dijital-banga-pesigirtine-hat-kirin-42038)

Çavkanî:JINHA



## [Li Mexribê 16’emîn Festîvala Fîlmên Jinan a Navneteweyî dest pê kir](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/li-mexribe-16-emin-festivala-filmen-jinan-a-navneteweyi-dest-pe-kir-42039)

16'emîn Festîvala Fîlmên Jinan a Navneteweyî ku îsal cih bide sînemeya Meksîkayê, li bajarê Salê ya Mexribê dest pê kir.

[https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/li-mexribe-16-emin-festivala-filmen-jinan-a-navneteweyi-dest-pe-kir-42039](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/li-mexribe-16-emin-festivala-filmen-jinan-a-navneteweyi-dest-pe-kir-42039)

Çavkanî:JINHA



## ['Divê çalakiyên li dijî zewaca temen biçûk bên berfirehkirin'](https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-calakiyen-li-diji-zewaca-temen-bicuk-ben-berfirehkirin-dive-calakiyen-li-diji-zewaca-temen-bicuk-ben-berfirehkirin-42040)

Civaknas Şox Îsmaîl destnîşan kir ku zewacên temen biçûk û yên bi darê zorê yek ji sedemên tundiya li ser jinê ye û got ku divê xebatên hişyarkirinê bên belavkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-calakiyen-li-diji-zewaca-temen-bicuk-ben-berfirehkirin-dive-calakiyen-li-diji-zewaca-temen-bicuk-ben-berfirehkirin-42040

Çavkanî:JINHA



## [Ji ber strana 'Sê jinên azad' dîsa hat darizandin](https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/ji-bo-strana-se-jinen-azad-disa-hat-darizandin-42045)

Danişîna doza hunermend Şîlan Emîne Yuksekkaya ji ber strana "Sê jinên azad" ku di mîtînga 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê de got dîsa hat darizandin, hat taloqkirin.

https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/ji-bo-strana-se-jinen-azad-disa-hat-darizandin-42045



# Li Rihayê polîsek gefa kuştinê li jinek xwar

Li Rihayê polîsek gefa kûştinê li jinek û birayê wê xwar.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-rihaye-polisek-gefa-kustine-li-jinek-xwar-42050

Çavkanî:JINHA




# 'Mafê jiyanê yê mexdûrên erdhejê tune tê hesibandin'

Seroka ÎHD’ê ya Şaxa Semsûrê Dîlan Guler diyar kir ku li bajarên erdhej çêbûye, binpêkirinên mafên mirovan bi berfireh bi awayekî piralî zêde bûne, da zanîn bi Komîsyona Erdhejê re wan binpêkirinan di cihê wê de tesbît kirine.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Ihd-mafe-jiyane-ye-mexduren-erdheje-tune-te-hesibandin-42051

Çavkanî:JINHA



## ‘Stargehên li Kurdistana Federe jinan naparêzin'

Endama Desteya Pêşketinê Gaşaw Ebdulqadir diyar kir ku jinên li Herêma Federe a Kurdistanê di stargehan de dimînin rastî şert û mercên nebaş û tundiyê tên.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/stargehen-li-kurdistana-federe-jinan-naparezin-42055

Çavkanî:JINHA



## Doza ku 24 dosyayan kirine yek sibê ye lê darizandina adil tune ye!

Der barê Ayla Akat de ku 24 dosyayan kirine yek sibê ye. Parêzer Hatîce Demîr diyar kir ku têkildarî dosyayê darizandinek adil tune ye û got: “Dema ku mijar daxwaza neteweyî û polîtîk a gelê Kurd be hiqûqa derasayî dikeve dewrê.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/doza-ku-24-dosyayan-kirine-yek-sibe-ye-le-darizandina-adil-tune-ye-42056

Çavkanî:JINHA



## Li Îzmirê belemeya lastîk bin av bû: 6 koçber mirin

Li peravên Çeşme a Îzmirê de ji ber binavbûna belemeya lastik hêjmara koçberên ku jiyana xwe ji dest daye giha 6 kesan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-Izmire-belemeya-lastik-binav-bu-hejmara-kocberen-miriyan-giha-6-an-42058

Çavkanî:JINHA



## Jinên Libya: Zagona hilbijartinê li dijî jinan e

Seroka navenda lêkolînan a jinan Abeer Amnina diyar kir ku li Libyayê zagona nû ya hilbijartinê ku rê li ber lidarxistina hilbijartinê vedike, daxwazên jinan bi cih naynin û destnîşan kir ku divê careke din di ber çavan de were derbaskirin.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/jinen-libya-zagona-hilbijartine-li-diji-jinan-e-42063

Çavkanî:JINHA



# [‘Li Mexribê zarokên keç ji perwerdeyê hatin dûrxistin’](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/li-mexribe-zaroken-kec-ji-perwerdeye-hatin-durxistin-42065)

Aîşa Belarbî ya ku di çarçoveya çalakiyên Festîvala Fîlmên Jinan a Navneteweyî di bilêvkirina pirtûka xwe ya bi navê "Li Mexribê Dîroka Civakî ya Avabûna û Perwerdehiya Zarokên Keç" axivî, da zanîn ku li Mexribê zarokên keç ji perwerdeyê tên dûrxistin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/li-mexribe-zaroken-kec-ji-perwerdeye-hatin-durxistin-42065

Çavkanî:JINHA




# [Ji bo kesên tê xwestin bên bêdengkirin banga têkoşîna hevpar](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221316?page=1)

ÊLIH - Hevseroka HEDEP'ê ya Êlihê Sedef Ozdemîr der barê kampanyaya ku TJA'yê bi dirûşima "Bi jin jiyan azadî ber bi azadiyê ve" da destpêkirin, de got: "Ez hemû jinên ku tê xwestin bên bêdengkirin vedixwînim têkoşîna hevpar."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221316?page=1

Çavkanî:JINNEWS



## [Li dijî şer piştevaniya jinê girîng e!](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221318?page=1)

ÎZMÎR - Jinan diyar kirin ku di şer û pevçûnên dawî de jî weke hemû şeran jin û zarok bûne hedef û destnîşan kirin ku divê jinên Filistînî û Îsraîlî hevkariyê bikin û jinên din ên cîhanê bi wan re piştevaniyê bixin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221318?page=1

Çavkanî:JINHA




## Ji bo kiryarên kuştina Garîbe û keça wê ji 11 sûcan ceza xwestin

AMED - Di îdianameya ji aliyê Serdozgeriya Komarê ve derbarê 6 bersûcên ku Garîbe Dag û keça wê Naîme Dag qetil kirin de ji 11 sûcan ceza hat xwestin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221323?page=1

Çavkanî:JINNEWS



## Rejîma Îranê biryara girtina du rojnamevanên din yên jin da

Dozgerê Giştî yê Girtîgeha Êvînê biryara girtina herdu jinên rojnamevan Seîde Şefiî û Nesîm Sultanbegî da.

https://rojnews.news/ku/?p=288185

Çavkanî:ROJNEWS



## Jinên Qeladizê: Divê jin bi jêhatinên xwe, ber bidin civakê

Beşek ji jinên ku li gel karên xwe yên li malê bi karên dest ve jî mijûl dibin û debara jiyana xwe dikin diyarkirin ku her çendî piştgiriya malbatê ji bo jinan gelek giringe jî lê mixabin gelek jin alîkariya malbata xwe nabînin, ji bo wê pêwîste jin hêz û jêhatinên xwe nîşanî civakê bidin.

https://rojnews.news/ku/?p=287942

Çavkanî:ROJNEWS



# Hat piştrastkirin ku aktivîsta aştiyê Vîvîan Silver hatiye kuştin

Li gorî agahiyan aktivîsta aştiyê Vîvîan Silver ku dihat fikirîn ku ji aliyê Hamasê ve dil hatiye girtin hatiye kuştin. Vîvîan Silver li Beeri Kibutzuna jiyana xwe didomand.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hat-pistrastkirin-ku-aktivista-astiye-vivian-silver-hatiye-kustin-42066

Çavkanî:JINHA



# Wezaretê der barê mirina Dîcle Naz de bersivê neda

Wezaretên ku bersiva pirsên der barê mirina hemşîre Dîcle Naz a ku di mala xwe de mirî hat dîtin, der barê bûyerê de tu hevokek jî negotin. Berdevka HEDEP'ê Ayşegul Dogan jî diyar kir ku dê dozê bişopînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/wezaret-nikarin-bersive-bidin-pesniyaren-der-bare-mirina-dicle-naz-de-42071

Çavkanî:JINHA



# ‘Riya pêkanîna zagona li dijî şîdetê hê jî ne diyar e’

Parêzvana mafên mirovan Mai Al-Obeidî diyar kir ku zagona hejmara 58 ku li Tûnisê ji bo têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan hatiye derxistin, dikare jinan li hemberî tundiyê biparêze lê hê jî rê û rêbazên pêkanîna zagonê ne diyar in.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/riya-pekanina-zagona-li-diji-sidete-he-ji-ne-diyar-e-42072

Çavkanî:JINHA




# Jinên Misirî: Ji bo rizgarkirina gelê Xezayê divê em bibin yek

Jinên Misirî bertek nîşanî êrîşên Îsraîlê yên li ser Zîvala Xezayê ku jin û zarok dibin hedef dan û ji bo gelê Xezayê banga piştevaniya navneteweyî kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-misiri-ji-bo-rizgarkirina-gele-xezaye-dive-em-bibin-yek-42075

Çavkanî:JINHA



## [Pervîn Buldan ji Rakel Dînk re got: Ev biryar me hemûyan êşand]

Wekîla HEDEP'ê ya Wanê Pervîn Buldan, piştî serbestberdana kujerê Hrant Dînk Ogûn Samast telefonî Rakel Dînk kir û wiha got: “Em li gel te ne.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/pervin-buldan-ji-rakel-dink-re-got-ev-biryar-me-hemuyan-esand-42081

Çavkanî:JINHA




## [Ji ber ferzkirina hicaba bi zorê Nerges Mihemedî nebirin nexweşxaneyê!]

Nergîs Mihemedî tevî ku ji ber girtina damarên dil divê were emeliyatkirin jî hikûmeta Îranê Nergîs Mihemedî nebir nexweşxaneyê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-ber-ferzkirina-hicaba-bi-zore-nerges-mihemedi-nebirin-nexwesxaneye-42084

Çavkanî:JINHA



## ‘Li Başûrê Kurdistanê berdêla nakokiyan kedkar didin’

Mamosta Saza Abdullah, bal kişand ku li Başûrê Kurdistanê boykota mamostayan ev 2 meh in berdewam dike û wiha got: "Berdêla nakokiyên di navbera hikûmet û Iraqê de kedkar didin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-basure-kurdistane-berdela-nakokiyan-kedkar-didin-42085

Çavkanî:JINHA



## Piştî serhildanên li Îranê li dibistanan rêveberî hatin guhertin

Şîler K. guhertina rêveberiya dibistanan a piştî serhildana li Îranê nirxand û got: "Pergalê hîs kir ku hin rêveber hevkariyê nakin" û sedema guhertinan jî anî ziman.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/pisti-serhildanen-li-Irane-li-dibistanan-reveberi-hatin-guhertin-42089

Çavkanî:JINHA



## 'Li dijî qirkirina çandî divê alternatîf bên afirandin'

ÊLIH - Xebatkara Navenda Çanda Bahar Çîçek Çelîk diyar kir ku li Kurdistanê li dijî polîtîkayên asîmîlasyonê divê alternatîf bên avakirin û wiha anî ziman: “Ji bo jiyankirina çand û zimanê xwe divê em li her qadê xebatan bimeşînin.”

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221441

Çavkanî:JINNEWS



## Jina ducanî li Rihayê hat qetilkirin

RIHA - Li navçeya Kaniya Xezalan Fîdda Uzun a ducanî ji aliyê mêrê pêre hatî zewicandî Ahmet Uzun ve hat qetilkirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221407

Çavkanî:JINNEWS



## ['Mêr hezkirina jinê nebaş bi kar tîne']

ÎZMÎR - Psîkologa Klînîk Alev Dumanoglu der barê tundiya psikolojik a ku mêr li jinê dike axivî û diyar kir bandora rolên zayenda civakî di mijara ku nehaydarbûna ji tundiya psikolojîk de gelek bi bandor e.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221443

Çavkanî:JINNEWS



## Ji bo jinan dîwana dengbêjan

ŞIRNEX - Şaredariya Silopiyayê ji bo jinan dîwana dengbêjan danî.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221500

Çavkanî:JINNEWS



# [Rakel Dînk: Jixwe bi salan em bi kujeran re heman bêhnê digrin!](https://jinhaagency.com/ku/rojane/rakel-dink-jixwe-bi-salan-em-bi-kujeran-re-heman-behne-digrin-42100)

Rakel Dînk, der barê berdana Ogun Samast ê kujerê hevjînê wê Hrant Dînk de wiha got: “Jixwe bi salan em bi kujeran re li heman cihî bêhnê digrin û ew li ber bêhna me ne.

[https://jinhaagency.com/ku/rojane/rakel-dink-jixwe-bi-salan-em-bi-kujeran-re-heman-behne-digrin-42100](https://jinhaagency.com/ku/rojane/rakel-dink-jixwe-bi-salan-em-bi-kujeran-re-heman-behne-digrin-42100)

Çavkanî:JINHA



# [Dadgehê di doza destdirêjiyê de îfadeyên bersûcan esas girt](https://jinhaagency.com/ku/rojane/dadgehe-di-doza-destdirejiye-de-ifadeyen-bersucan-esas-girt-42098)

Hinceta biryara beraetkirina 21 kesên ku li Amedê bi awayekî daîmî destdirêjî li zarokekî 12 salî kirin, hat eşkerekirin.

[https://jinhaagency.com/ku/rojane/dadgehe-di-doza-destdirejiye-de-ifadeyen-bersucan-esas-girt-42098](https://jinhaagency.com/ku/rojane/dadgehe-di-doza-destdirejiye-de-ifadeyen-bersucan-esas-girt-42098)

Çavkanî:JINHA



# Di bin şertê penaberiyê de jin çanda tenûran zindî dihêlin

Çanda çêkirina tenûran rêwîtiya xwe ya li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cudî Mexmûrê ku çandên cuda li cihekî hevpar digihêjin hev balkêş dike û jinên li wargehê hewl didin di bin şertê penaberiyê de çanda tenûrê bidomînin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/di-bin-serte-penaberiye-de-jin-canda-tenuran-zindi-dihelin-42096

Çavkanî:JINHA



## ‘Li navenda Arî tiba xwezayî beşa bingehîn e’

Weqfa Jina Azad li hemû bajarên Rojavayê Kurdistanê bi rêxistinkirina xebatên civakî roleke aktîf girtiye ser milên xwe. Yek ji navendên girêdayî Weqfa Jina Azad navenda Tendursitiyê ya Arî ye ku tê de dermanên xwezayî beşek bingehîn e.

https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/li-navenda-ari-tiba-xwezayi-besa-bingehin-e-41979

Çavkanî:JINHA



## Wênesaza ku sînoran nas nekir: Xwedî li şoreşa jin derkevin

Wênesaz Besma Hisên ya ku ji zaroktiya xwe ve ji wênesaziyê hez dikir, nexweşiya wê ya penceşêrê li pêşiya wê nebû asteng û niha li Hîlala Zerîn mamoste ye got:”Divê bi riya hunerê xwe xwedî li dîrok, çand û destkeftiyên şoreşa jin derkevin.”

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/wenesaza-ku-sinoran-nas-nekir-xwedi-li-soresa-jin-derkevin-41993

Çavkanî:JINHA



# Li 3 navendan çalakiyên 25′ê Mijdarê

Bi boneya nêzîkbûna 25′ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan, li Kobanê belavok hatin belavkirin, li Şehbayê daxuyanî hat dayîn û li Dêrikê pêşangehek wêneyan hat vekirin.

https://hawarnews.com/kr/li-3-navendan-calakiyen-25e-mijdare

Çavkanî:ANHA



Kongra Star
18.11.2023